Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1257 19-Adar-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# Bi heyecaneke mezin amedekarî ji bo Newrozê tê kirin

Dîlan Mulhim\ Qamişlo

**Hevseroka Koma Muzîkê Newroz Silêman diyar kir ku bi heyecaneke mezin ew amedekariya Newroza 2025`an de dikin, herwiha komên wan li gorî xwesteka gel li navçeyan werin belavkirin. Stranên ku ji bo wê rojê hatine hazirkirine stranên Şoreşgerîn e.**



Pîrozbahiyên Cejna Newrozê ya îsal wê li 7 qadan bên lidarxistin. Di 14`ê Adarê de li kolanên bajaran dest bi xemilandinê hat kirin, ji bo tevlêbûna pîrozbahiyan dê komîteya amadekar serdana partiyên siyasî, rêxistin, rûspiyên pêkhateyên Kurd, Ereb, Suryan-Asûr û Ermen bike. Her wiha bi rêya komînan dê serdana malbatan bê kirin û ji bo bangê seyare li kolanan bigerin. Di heman demê de 15`ê Adarê li bajarên kantona Cizîrê dê tax bi tax agirê Newrozê bê vêxistin. Di 17`ê Adarê de Rêveberiya Xweser a Kantona Cizîrê bi daxuyaniyekê bername û detayên der barê pîzobahiyên Newrozê, li Çerxerêya Efrîn a Qamişloyê ragihîne. Di 20`ê Adarê de şêniyên li bajaran û nûnerên Rêveberiya Xweser a Kantona Cizîrê li hemû bajaran serdana gorên şehîdan bikin.

Wekî her sal bi hatina Cejna Newrozê endamên Tev-Çand, Çand û Huner ji bo pêşwazîkirina vê roja pîroz, amadekariyan dikin. Îsal jî Tev-Çand bi kelêcanek mezin amadekariyên pîrozkirina Newrozê dike.

Derbarê amadekarariyên Tev-Çand ji bo pîrozkirina Cejna Newrozê, hevseroka Komîna Muzîkê Newroz Silêman ji Rojnameya me re axivî.

**'Îsal sala aştiyê ji tevahiya cîhanê re'**

Newroz Silêman di destpêka axaftina xwe de Cejna Newrozê li gelê Kurd pîroz kir û wiha got: "Bi heyecaneke mezin hemû endam û komên me amedekariya Cejna Newroza 2025`an dikin. Rojane endam, hunermend û komên me perwerdeyan dibin, herwiha em hewl didin ku hunermedên ku tucarî tevlî Newrozê nebûne, tevlî Newroza îsal bibin. Komên me yên hunerî ên bajaran di asteke baş de tên şopandin. Stranên ku me ji bo Newrozê amedekirine stranên Şoreşgerî ne."

**'Bi rihê berxwdana Kawayê Hesinkar, em ê agirê Newrozê geştir bikin'**

Newroz Silêman anî ziman ku ew bi coşeke mezin hazirtiya Cejna Newroza îsal dikin û wiha berdewam kir: "Wekî tê zanînin em berî Newrozê bi çend mehan dest bi amedekariyên komên muzîk û şano dikin, herwiha komên şano û muzîkê li gorî xwesteka gel ji bo navçeyên Rojavayê Kurdistanê tên belavkirin. Hunermendên me yên ku tevlî Newrozê bibin ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ne, di heman demê de em amedekariya komên xwe dikin ku tevlî pîrozbahiyên Cejna Newrozê li Şamê û welatê cîran weke Libnan bibin. Bi hêviyê azadiyê û bi rihê berxwdana Kawayê Hesin Kar, em ê agirê Newrozê geştir bikin."

**'Em ê Newroza 2025`an bikin Newroza azadiya Rêber Apo'**

Hevseroka Komîna Muzîkê Newroz Silêman da zanîn ku Banga Rêber Apo a bi navê Aştî û Civaka Dîmokratîk banga azadiyê bû ji bo tevahiya cîhanê û wiha bi dawî kir: "Banga Rêber Apo ji bo tevahiya cîhanê û taybet gelê kurd tê wateya dîroke nû, herwiha bi riya vê banga Rêber Apo, gelê kurd wê Newroza 2025`an bi heyecaneke pir mezin were pîrozkirin. Di heman demê de em bi berxwedanî, Îradeyekî xurt û têkoşîneke mezin tev bigerin. Banga min ji tevahiya gelê kurd re heye ku asta têkoşîn û berxwedaniya xwe xurt bikin, herwiha pêwîst e Newroza îsal bi moral û heyecaneke pir xurt were pîrozkirin."



# Copernicus: Tebeqeyên qeşayê gelekî dihelin

Navenda Nûçeyan

**Navenda Çavdêriyê ya Copernicus a girêdayî Yekîtiya Ewropayê diyar kir ku di meha Sibatê de tebeqeyên qeşayê yên li Cemsera Bakur û Antartîkayê gelekî heliyane.**



Li gorî Copernicus'ê di 7'ê Sibatê de tebeqeyên qeşayê yên li derdora Cemsera Bakur û Antartîkayê gelekî heliyane. Helîna tebeqeya qeşayê ya li Antartîkayê her çend negihiştibe asteke rekor jî li gorî standartên demsalî ji sedî 26 kêm bûye.

Asta germahiya sala 2024'an ji ya sala 2023'yan derbas bibû û gihiştibû astên herî bilind. Ev yek nîşan dide ku li seranserê cîhanê asta germbûnê zêde dibe û ji ber vê yekê jî qeşaya li ser behran roj bi roj zêdetir dihele.

Helîna qeşaya li ser behran berovajî ya li ser erdê ye, rasterast bandorê li pileya bilindbûna behran û zêdebûna germahiya gerdûnî dike.

Zanyar gelek caran diyar dikin ku divê li hemberî kêmbûna tebeqeyên qeşayê, zêdebûna germahiyê pêngavên hewce werin avêtin.

Bi kamîreya Ayşa Silêman



## FERHENGA BIWÊJAN

**Li ber hev pehn bûn:**
- Şerê di navbera wan de dirêj bû; pir li hev xistin.

**Pehnî ber hev bûn:**
- Bi heman wateyê.

**Ser de çû/bi ser de çû:**
- Daberiziyê; êrîş kirê; çû da lê bixe.

**Sing li hev dan/sing li hev xistin:**
- Bi hev çûn; şerê hev kirin.

**Singa min û wî ket hev:**
- Di şer de ez û ew hatin hemberî hev.

**Şûrê wî bêkalan e:**
- Her dem ji şer re amade ye.

**Xwîn gihatiye çokê:**
- Kuştî û birîndar pir in; şer pir giran e.

**Yan wê Xwedê bide diya min yan diya te:**
- Yan ezê bi ser bikevim, yan tuyê.

**LI SER RÊWÎTIYÊ**

**Berê xwe da oxirê, pişta xwe da felekê:**
- Ket ser riyeke dûr; bi riyeke dûr ve çû.

**Binê piyê min dixwere:**
- Riyek li pêşiya min e

**LI SER NEDÎTINA KÊMAYIYÊN XWE**

**Ber bi mino, li xwe tino:**
- Behsa kêmayiyên min dike, lê kêmayiyên xwe nabîne.

**Bizinê ji miyê re got min ew dera te dît:**
- Tu eyba xwe nabînî tu behsa ya min dikî.
(Kesên kêmayiyên wan pir, dema behsa kêmayiya yekî dikin, hingê tê gotin)

**Dirêjika di çavê xwe de nabîne, derziya di çavê hevalê xwe de dibîne:**
- Kêmayiyên xwe yên mezin nabîne, kêmayiyên kesên din yên piçûk dibîne.

**Kor gote kor; min çavê teyî kor çi kiro:**
- Dema kesekî kêmayiyên wî heyîn behsa kêmayiyên kesekî din dike hingê tê gotin.

**Reş bi beş kenî, beş bi eletewş:**
- Hin henekên xwe bi wî dikin, ew jî henekên xwe bi hinekên din dike.

**Safokê/bêjingê ji derziyê re got; qulek di te de heye:**
- Kesên kêmayiyên wan pir, dema yekî rexne dikin hingê tê gotin.

**Ser xwe re bendek wê re:**
- Rewşa wî ji ya min xirabtir e; behsa xwe nake; behsa rewşa min dike.

**Wî bi xwe de gû kiriye dibêje bêhna fisan ji te tê:**
- Kesên kêmayiyên xwe nabînin ji bo wan tê gotin.

**Ziman paleyê xwediyê xwe ye:**
- Ti kes xwe neheq nake; ti kes sûcê xwe nabîne; ti kes nabêje dewê min tirş e.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Jin azadiya xwe di azadiya Rêber Apo de dibînin'



Parêzera Rêber Abdullah Ocalan Suzan Akîpa diyar kir ku di mitînga 8'ê Adarê ya Amedê de peyama ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo jinan şandibû gelekî girîng bû, moral û hêz da tevahiya jinan.**R-2**

## Efrîn.. di navbera 7 sal ji qirkirin û vegera bi ewle de

İbrahîm Şêxo da zanîn ku bi derbasbûna 7 salan li ser dagirkirina herêma Efrînê ji aliyê dagirkeriya Tirk ve ku zêdetirî 800 hezar kes koçber bû. Kiryarên dijmirovî yên çeteyan û siyaseta guhartina demografîk hîna jî tê domandin.**R-3**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1257 19-Adar-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# NEWROZA AZADIYA RÊBER APO

Ji bo gelê kurd Newroz nîşaneya vejîneke nû li hember zordarî û desthilatdariyê ye. Ji agirê Kawayê Hesinkar bigire heyanî agirê Newroza 2025'an gelê kurd têkoşîna azadiyê roj bi roj jiyan dike. Bi taybet piştî banga dîrokî ya Rêber Apo têkoşîna gelê kurd di pêvajoyeke dîrokî ya pir girîng re derbas dibe. Newroza îsal ku bi dirûşmeya "Azadiya Fizîkî ya Rêber Apo, Misogeriya Civaka Demokratîk e" tê pîrozkirin, wê bibe Newroza azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û çareseriya pirsgirêka gelê kurd.**R-6**









## Guhertina çarenûsa gelan a dîrokî Banga Aşitî û Civaka Demokratîk e



Rojnamevan Sînan Cûdî ragihand ku pêwîst e di vê pêvajoyê de Rêber Apo tenê neyê hiştin û wiha got: "Rêber Apo ev banga dîrokî ji bo serxwebûna hemû gelên azadîxwaz kir, lewma jî divê destê Rêber Apo bê xurtkirin."**R-4**

## 'Bi berxwedanê wê agirê Newrozê geştir bibe'



Hevseroka TEV-ÇAND`ê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Sumeya Mihemed tekez kir ku agirê azadiyê wê her bilind bimîne û wiha got: "Gereke em Newrozê bikin Newroza aştî û azadiyê. Bi saya berxwedan û hevgirtina gelan wê agirê Newrozê geştir bibe."**R-7**

## 'Bi destûrekî wiha desthilata Şamê kete şaştiyek mezin'

Rêveberê Navenda Çav a Rapirsînan, Silêman Ilyas diyar kir ku bi derxistina destûrekî bi vî rengî desthilata Şamê şaştiyeke mezin kir û got, "Destûr nûnertiya hemû gelên Sûriyê nake û nayê zanîn eger wê ev destûr demkî yan mayînde be."**R-5**





**HTŞ'ê nikare ezmûnê derbas bike!**
Dilyar Cizîrî R-4



**Nirxandinên Cemîl Bayik**
Farûk Sakik R-5



**Demokrasî wê Sûriyê bike yek û rê jêre veke**
Zekî Bedran R-5



**Roja nû, roja ronahî û azadiyê ye**
Rohat Bulut R-6

# Jin azadiya xwe di azadiya Rêber Apo de dibînin

Parêzera Rêber Abdullah Ocalan Suzan Akîpa diyar kir ku di mitînga 8'ê Adarê ya Amedê de peyama ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo jinan şandibû gelekî girîng bû, moral û hêz da tevahiya jinan.

**Amara Baran/Qamişlo**

Derbarê girîngiya peyama Rêber Abdullah Ocalan ku bi boneya 8'ê Adarê Roja Jinên Kedkar a Cîhanê şandibû, parêzera Rêber Abdullah Ocalan Suzan Akîpa bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha ye:



**-Bi destpêkirina pêvajoya aşitî û civaka demokratîk re Rêber Apo ji gelek aliyan re name şand, bi boneya 8'ê Adarê jî ji bo jinan name şand, nameya ku Rêber Apo şandibû bû cihê moral û keyfxweşiyê. Hûn vê yekê çawa dinirxînin?**

Peyama Rêber Abdullah Ocalan a 8'ê Adarê, wek we jî got moral bilind kir. Ji ber ku fikrên Rêber Abdullah Ocalan ên ku têkoşîna azadiya jinê bi leztir dike hene. Jin jî li van fikran xwedî derdikevin û pêk tînin. Rêber Abdullah Ocalan di peyama xwe de jî dibêje; Jiyaneke balkêş a bi jinan re, wekî prensîba herî girîng E. Ew ji bo çand, dîrok û azadiya jinê gelek xebatan dike. Teorî pêş xist. Moralê jinan ji ber vê yekê ye. Ji ber ku jin azadiya Rêber Apo, bi azadiya xwe re wekhev dibînin. Ew peyama ku ji sînorên Girava Îmraliyê derbas bû û li qadan deng veda, banga azadiyê ye ji bo jinan.

**Rêber Apo di peyama xwe de behsa Pergala civakî ya zilamên serdest ku her tim ji bo jinan pirsgirêkan diafirîne, dike. Li ser wê hûn dikarin çi bijin?**

Pergala serdest a mêr, bi tunekirina hebûna jinê pergala xwe afirandiye. Pergalek li ser tunebûna jinê ye. Serhildana jinê, jixwe vê bingehê dihejîne. Vê pergalê, li dijî jinan şer îlan kiriye. Li dijî jinê, şerê îdeolojîk û fizîkî heye. Krîzên aborî, şer, girtin û nexweşî herî zêde bandorê li ser jinan dike. Lewma ji bo azadiya jinê sedemên me yên pir mafdar hene. Helbet vê pergala serdest a mêr herî zêde di zihniyet, ango bîrdozî de xwe bi cih kiriye. Rêber Abdullah Ocalan jî di peyama xwe de balê dikişîne ser vê xalê. Ji bo em li dijî vê zîhniyetê têbikoşin, divê em xeta azadiya jinê baş analîz bikin, dîroka windakirina jinê baş bixwînin, nirxên jinê ji nû ve pênase bikin û bi cih bînin.

**-Banga Aştî û Civaka Demokratîk ji bo jinan jî Ronesans e. Pêwîst e jin di vî pêvajoy de çawa beşdar bibin û ronesansê çawa pêk bînin?**

Ez bawer im peyva "aşt" di zimanê Hûrî de tê wateya "jin". Ji aliyê din ve dema em îro lê dinêrin slogana "Jin jiyan azadî" gihîştiye asteke gerdûnî. Rêber Apo , mîmarê ve sloganê ye. Tene jinên Kurd na, tevahî jinên cihanê xwedî li vê sloganê derketin. Ev slogan, jinê bi azadîyê pênase dike. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku jin di avakirina aştî û azadiyê de û pê re jî di avakirina civaka demokratîk de hêza bingehîn a damezrîner e. Formula aşitî û azadîye, di çanda jinê de heye. Jin dikarin vê bikin. Ger di şer de a ku herî zede wenda kiriye jin be, wî çaxî wê jin herî zêde di aştiyê de bi dest bixin. Rêber Apo dibêje ev ê bibe ronesans. Di ve pevajoyê de, wekî jin em dikarin bi avakirina tor, platform û inisiyatifên aştiyê, qada aştiye geş bikin. Li dijî zimanê zayendperest û zimanê şer, zimanê jinê û zimanê aştiyê ava bikin. Ji hemû civakê re em bêjin aştî pêwîst e. Bi awayekî aktîftir beşdarî siyaseta demokratîk bibin, ji bo avakirina aştiyê zemînên qanûnî biafirînin, zextê li ser parlamento bikin û hikûmetê neçar bikin. Û a herî girîng jî ev e. Di ve pevajoyê de wekî aktorek û wekî aktorek xwedî paradigma, azadîya fizikî a Rêber Apo , garantor e ji bo aştî û demokrasî ye. Ji ber vê yeke, jin hem di hela siyasî û civakî de hem jî di hela hukukî de, bi rê û rebazên cuda cuda tebikoşin, em di wî baweriyê de ne ku azadiya Rêber Apo nêz bûye.



**-Rêber Apo di dawiya peyama xwe de jinan bi êşqa Mem û Zîn û Derweşê Evdê silav dike. Rêber Apo eşq û evînê çawa dinirxîne û hun ji bo vî dikarin çi bejin?**


Rêber Apo pir caran got ku, "Haqiqat evîn e, evîn jî jiyanêke azad e." Bi rastî hem di Mem û Zîn hem jî di Derweş û Edûlê de a ku derket holê ev bû. Evînek ku hevdû fetisandin na; samîmîyet, azadî û azadîya gel armanc dikir hebû. Evîn, tenê di navbera jinekê û merekî de nîne. Modelên jin û mêr ên bi hezaran salan hatine inşakirin, di vê yekê de bi bandor in. Rêber Apo dibêje, bi zilamê serdest ê ku komkujî, qirkirin, îstîsmar, feqîrî û kuştinê tîne, hezkirin nabe. Ew, evîn û kuştinê bi tevahî dijberî hev dibîne. Ya sereke ew têkilî ye ku hevdû mezinkirin, hevdû zindîkirin hebe. Ev nirxên evînê biherikin nav civakê ku geş bibe û wekî çandek şîn bibe.

# Zarokên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi sûcên şer re rûbirû ne

**Zana Roj/ Qamişlo**

**Berpirsa Rêxistina Stêrk ya Şopandin û Parastina Mafê Zarokan a Bakur û Rojhilatî Sûriyê Cûliya Xilo diyar kir ku zarok dibin qurbaniyên kiryarên dagirkeriya Tirk û got: "Zarokên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi sûcên şer re rûbirû ne û li hember hedefgirtina zarokan hemû rêxistinên navnetewî bê deng in".**

Kiryarên dagirkeriya Tirk di herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de tenê di çarçoveya hedefgirtina gel û talankirina cografiya herêmê de sînordar neman. Ji destpêka aloziya Sûriyê ve dagirkeriya Tirkiyê komkûjiyan pêk tîne. Hedefgirtina zarokan di tavahî Sûriyê de bi awayekî bê lêpirsîn tê domandin. Hêjayî balkişandinê ye ku herî dawî li beravên Sûriyê bi hezaran zarok bê sûc û guneh li ser destê komên çekdar bi hinceta bermahiyên rêjîma Esed in hatin qetilkirin.



Gelo çi gunehê ew zarokê 1 salî heye ku bibe qurbaniya siyaset û nijadperestiyê?

Bi taybet di herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de dagirkeriya Trikiyê bi hezaran komkujî derheqê zarokan de pêk aniye. Piştî banga Aştî û Demokrasiyê, êrişên faşîzma Tirkiyê li ser herêmê nehatin rawestandin. Herî dawî li bajarê Kobanê malbatek bi temamî hate hedefgirtin di encam de 7 zarok tevî dayîk û bav hatin şehêd xistin. Her wiha 2 zarokên malbatê bi giranî birîndar bûn. Ev kiryar di bin bêdengiyeke navnetewî û bê hesab xwestin tên domandin.

Navê Şehîdan ev in: Ahîn (15), Dijle (14), Dilovan (13), Yesêr (6), Salîhe (4), Fewaz (2), Evêste (8 meh) dayîk û bav Osman Berkel Ebdo (42) û Xezal Osman Ebdo (39). Kesên birîdar Ronîda (18) û Narîn (9).

**Di Sûriyê de zarok ji mafê xwe yên rewa bê par in**

Têkildarî vê mijarê Berpirsê Rêxistina Stêrk ya Şopandin û Parastina Mafê Zarokan a Bakur û Rojhilatî Sûriyê Culiye Xilo ji rojnameya me re axivî û wiha dest bi axaftina xwe kir: "Bi dagirkeriya Tirkiyê re li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi taybet û li ser Sûriyê bi giştî rewşa zarokan her ber bi xeteriyê ve çûye. Di Sûriyê de bi giştî zarok ji mafê xwe yên herî rewa bê par in û rojane rastî topbaranan tên. Her wiha bi milyonan zarok hatin koçber kirin û neçar man ku dev ji xwendina xwe berdin. Mafê parastina zarokan di giştî Sûriyê de nîn bû ev yek heyanî roja me îro jî berdewam dibe. ji lewra em heyanî niha jî ji qetilkirina zarokan di bin navên cuda de dibin şahid".

**Bi komkujiyekê 9 giyan bûn qurbanî**

Culiye da zanîn ku dagirkeriya Tirkiyê dest ji komkujiyên xwe bernade û wiha pê de çû: "Di encama siyaset û pilanên dagirkeriyê yên bê navber li ser gelê Kurd bi taybet bi hovîtiyeke dij mirovî faşîzma Tirkiyê sivîlên herêmê hedefdigre. Herî dawî me dît ku çawa li gundekî ya bajarê Kobanê malbatak bi temamî hate hedefgirtin, di wê malbatê de 7 zarok hatin şehîd xistin. Ma ev ne sûc û qurbaniyên şer in. Faşîzma Trikiyê di topbaran û êrişên xwe de tu carî gel, hêza leşkerî û zarok ji hev du cuda nekirine. Bi heman hovîtiyê giyanên pîroz yên benda jiyanên de hedef digrin. Her wiha divê em ji bîr nekin ku di herêmên dagirkirî de ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê û komên çeteyên wê ve rojane zarok tên kuştin, revandin, îşkencekirin, tecawîzkirin û zewicandin."

**Bêdengiya cîhanî parastina berjewendiya ye**

Culiye bi van gotinan axaftina xwe bi dawî kir: "Ewqas salin li pêşiya tavahî cîhanê û raya giştî dagirekriya Trikiyê sûcên dijmirovî li ser gelê Kurd û zarokên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Sûriyê bi giştî pêk tîne. Lê rûxmî belgekirin û derxistina rastiya Tirkiyê ku çawa zarok bi kîmyasalê, çekên nûklerî û bi topbaranan têne hedefgirtin, mixabin raya giştî û rêxistinên têkildar bê dengin. Ev bêdengî di encama lihevkirin û berjewendiyên wan bi Tirkiyê re tê kirin. Ji lewra erka li ser me em di eşkerekirina heqîqet û parastina mafê zarokan de xebatên berfireh bimeşînin."



# Çira dengbêjiya hemdem; dengbêj Mihemed Welîd

Mihemed Welîd dengbêj, nivîskar û helbestvanekî kurdperwer e. Ew ji sala 1988'an ve besteyan dinvîsîne herwiha di 1989'an de yekem elboma xwe berî 23 elbomên din, derxistiye. Wî kedeke mezin di warê çêkirina elboman û daneheva folklora kurdî ya herêma Efrînê de kiriye.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Zanist û qada dengbêjiya kurdî, yek ji kevintirîn qadên hunera devkî ye, li her çar parçeyên Kurdistanê berbelav e, bi dirêjahiya dîroka kurdan jî gelek dengbêj bi dengê xwe muhra xwe li zanista dengbêjiyê xistine. Dengbêjên kurd weke stêrkên geş gerdûna hunerê xemilandine, bi çûyîna her dengbêjekî/ê stêreke geş ji esîmanan diket. Mîna Şahkiro, Hecî Ebdulkerîm, Keremê Kor, Kazoyê Wanê, Kawîs Axa, Şukrî Rêkanî, Evdî, Cemîl Horo, Bavê Selah û hwd…

Di roja îro de, dengbêjên kurd kêm tên dîtin, yek ji dengbêjên hemdem ê çiraxa hunera resen a kurdî, bi taybet a devera Efrînê vejandiye, dengbêj Welîd Mihemed e.

Mihemed Welîd têkildarî jiyan û hunera dengbêjiya xwe, ji rojnameya me re axivî.



**Jidayîkbûn û xwendina dengbêj Mihemed Welîd**

Welîd girêdayî jidayîkbûn û xwendina xwe wiha bi lêv kir: "Di sala 1967'an de li gundê Berava yê girêdayî navçeya Şera ya bi ser Efrînê ve ji dayîk bûme. Malbata me biçûk bû, çar xuşkên min hebûn, dema ku ez 5 salî bûm, bavê min koça dawî kir, lewma jî bi dayîka xwe û çar xuşkên xwe re zarokekî bi tena xwe dijiyam. Ez sêwî mezin bûm, dayîka min, em xwedî kirin. Ez li gundê xwe çûm dibistanê, qonaxa seretayî xwend, piştî wê em bi malbatî çûn Helebê, min xwendina navîn berdewam kir û pê re jî min bi merivekî xwe re dest bi karê boyaxtiyê kir. Ji ber şert û mercên jiyanî yên zehmet ku malbata me tê re derbas dibû, min xwendina xwe berdewam nekir, da ku ez malbatê xwedî bikim, min tenê pîşeya boyaxtiyê dikir. Min gelekî ji xwendinê hes dikir, piştî sê salan ez lê vegeriyam, ev yek jî bi saya cîranên me, keçên wan bekeloriya dixwendin, wan dizanîbûn ku ez ji xwendinê hes dikim. Min refê 12'an, beşa wêjeyî bi awayekî azad bi dawî kir, paşê malbatê ez bi mal kirim."

**Nivîsandina helbestan û destpêkirina bizava wî ya hunerî**

Dema ku min bekeloriya bi dawî kir û di sala 1988'an êdî ez mijûlî nivîsandina helbestê bûm, bi taybet jî beste. Carekê hunermend û dengbêjê kurd Elî Dawûd ku ew jî ji Efrînê ye, hem jî dibû merivê me herwiha têkiliya me bi hev re hebû, hat gel me û helbesteke min kire stran. Wî coş û kelecan da min, bi saya dengbêj Elî Dawûd helbestên min belav bûn, piraniya dengbêjên Efrînê li min kom bûn, da ku helbestan ji wan re binivîsînim û ew bikin stran. Di wê demê de min dest bi pêşkêşiya zemawend, şahî û Newrozan kir, bi dirêjahiya 6 salan min hemû aheng pêşkêş dikirin, hem jî helbestên xwe dixwendin. Min û Elî Dawûd bi hev re komek muzîkê çêkir, xebateke hevbeş dihat kirin. Piştre min komek muzîkê ya taybet, di 1997'an de çêkir, tê de muzîkjen û hunermend hebûn, min helbest ji wan re dinivîsand. Herwiha min di wan salên 90'î de helbestên xwe di gelek kovarên kurdî, mîna Xunav, Buhar û hwd… belav dikir."

**Destpêkirina dengbêjiya Mihemed Welîd**

Mihemed têkildarî destpêkirina gera dengbêjiya xwe wiha anî ser ziman: "Dema ku min koma xwe ya muzîkê ava kir û derketim hemû cureyên şahiyan, zemawend, Newroz, ahengên netewî û hwd… hunera dengbêjiyê li cem min dest pêkir. Tembûrvan û stranbêjên komê dihatin daxwaz ji min dikirin ku ez stranên xwe ji wan re bêjim da ku ew awaz û gotinên dengbêjiyê saz bikin. Wê demê min gelekî ji dengbêjiyê hes dikir. Rojekê ji rojên ku min dengbêjî ji wan hunermendan re digot, mamosteyek hat gel min û got: "Eger dengê te xweş e, stranan dinivîsîne, çima tu bi xwe stranên xwe nabêje." Gotina wî coş û kelecaneke mezin li cem min ava kir û hişt ez bi xwe dest bi hunera dengbêjiyê bikim. Piştî wê di sala 1998'an de ez çûm zemawendekê, gelek dengbêjan stran gotin min jî weke yekem car kilamek got. Piştî min ew kilam got, hemû kes li dora min kom bûn, ji dengbêjên din bêtir bi dengbêjiya min re kêfxweş bûn. Jê û şûn de min bi awayekî fermî dest bi dengbêjî û stranbêjiyê kir, hem jî min helbestên xwe didan dengbêjan. Herwiha min dest bi çêkirina elboman kir, bi derxistina elboma 6'an ez gelekî navdar bûm di herêma Efrînê de, ji ber ku min tê de kilama Ferhad û Şêrînê got, ji wê demê heta roja îro ez bi wê stranê hatim naskirin."

**Berhemên wî**

Mihemed Welîd derbarê berhemên xwe de wiha axivî: "Elboma min ya yekem bi navê 'Duniya Bi Xwe Dilxatir e' derxisit, elboma duyem a bi navê 'Qertel' derxist heta derxistina elboma 24'an. Ji wê demê heya niha min 24 elbom derxistine, 8 ji wan ên min in û yên din jî kilamên dengbêjiyê yên kurdî ne, bi dengê min hatine vejînkirin. Herwiha min kilîp çêkirin, hem ên taybet û hem jî yên hevbeş, 4 kilîpên taybet hene û gelek ên hevbeş bi hunermendên cuda re hatine çêkirin. Kilîpa taybet a yekem, bi navê 'Çarşema Sor' di sala 2010'an de derxist, piştî wê min kilîpa duyem bi navê 'Evista Xabûr', a siyem jî bi navê 'Here Kurê Min Here û ya dawîn jî kilîpa bi navê 'Bes e Felek' derxistin. Di heman demê de kilîpeke hevbeş ya 27hunermendên Efrînê di sala 2013'an de hat derxistin. Li aliyekî din min 3 pirtûk û dîwaneke xwe çap kiriye, berhema yekem Cefa ye ew çîrok e, di sala 2013'an de çap bûye. Pirtûka Di Bin Siya Evînê de pirtûka duyem e, li ser dîroka dengbêjiyê û bûyerên dîrokî ye, tê de çîroka Ferhad û Şêrîn, Bêrîvana Cindî û hwd… hene. Çîrokeke din bi navê 'Siya Ser Bi Dûman' li ser dîroka berxwedaniya jinê ye, herî dawî dîwana min ya bi navê 'Ji Hundirê Bahozê di sala 2025'an de hate çapkirin. Gelek berhemên min hebûn, di êrişa dagirkirina Efrîn û Şehbayê de, du caran berhemên min li şûn min man. Ji wan pirtûkek li ser jiyan, xebat û berhemên hunermendên kevnar ên Efrînê bû, min kede mezin a 5 salan ji bo wê dabû. Niha berhemên cuda li ber destê min hene û di demê pêş de hem ezê pirtûkan çap bikim û hem jî di warê hunera dengbêjiyê de xebatê bikim."



# 'Bi berxwedanê wê agirê Newrozê geştir bibe'

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

**Hevseroka TEV-ÇAND`ê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Sumeya Mihemed tekez kir ku agirê azadiyê wê her bilind bimîne û wiha got: "Gereke em Newrozê bikin Newroza aştî û azadiyê. Bi saya berxwedan û hevgirtina gelan wê agirê Newrozê geştir bibe."**

Newroz cejneke neteweyî ye û nîşana serhildana Kurdan li dijî dijminan û têkbirina zilmê ye, 21`ê Adarê weke her kes dizane roja nû ye, gel hêviyên xwe nû dikin. Çîroka Newrozê vedigere li qehremanê Kurd "Kawayê Hesinkar" tê naskirin ku li dijî qiralê bi navê "Dehak"dest bi serhildanekê dike û bi ser dikeve. Rêber Apo jî mîraseya Kawayê Hesinkar e ku bi fikir û feslefeya xwe agirê Newrozê gurtir kir. Gelê kurd bi hêvîne ku bi pêşandana dîmenên Rêber Apo di Newrozê de kêfxweşiya xwe temam bikin.



Derbarê Cejna Newrozê de, hevseroka TEV-ÇAND`ê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Sumeya Mihemed ji rojnameya me re axivî..

**'Peyama Rêber Apo ji bo tevahî cîhanê bû'**

Sumeya Mihemed di destpêka axaftinên xwe de behsa pêşketin û geşdanên dawî ku li herêmê diqewime kir û wiha got: "27`ê meha Sibatê rojeke hêviya gelê kurd nû kir, ji ber ku peyama Rêber Apo hate raghandin û bi dîrokî hate binavkirin, ji ber ku di peyama xwe de aştî raghand. Gelê kurd peyama Dîrokî bi coşeke mezin pêşwazî kir. Bi taybet piştî zêdetirî sê salan ku tu agahî ji Rêber Apo nedihat girtin.Gelê kurd ji zarokên 7 salî heya kesên bi temen mezin li benda agahiyekê bûn, peyama rêber Apo cihê kêfxweşiyê bû ji bo her kesî bû hêzeke mezin, gelê kurd bi raghandina peyamê diha zêdetir berxwedana xwe berdewam kirin."

**'Peyamên Rêber Apo her dem ji bo aştiyê ne'**

Sumeya Mihemed wiha berdewam kir: "Ev zêdetirî 50`î sal in ku gelê kurd di bin îşkence, qetilkirin, dûrxistin û paşguhkirina ji tevahî qadên jiyanê de ne, Kurdistan di nava çar dewletan de hate dagîrkirin, lê gelê kurd tu carî bêdeng nema her dem li qadan bû da ku mafê xwe bidest bixe serî hilda, êdî di her çar perçeyan de şoreş û serhildan hatin destpêkirin û li hemberî wan ji hovtrîn awayên îşkenceyê hate pêkanîn. Bi taybet li Rojavayê Kurdisatê ku ev zêdtirî 14 sal şoreş tê kirin li dijî dethilatdariyê, gelê kurd ne tenê ji bo mafê xwe şoreş kir, lê ji bo tevahî gelên herêmê yên din da ku felsefeya Rêber Abdullah Ocalan ya Netewa Demokratîk û biratya gelan pêk bînin. Ji ber vê yekê peyama Rêber Apo ji bo tevahî gelan bû, peyam her dem aştî, aramî û li dijî kuştinê bû. Rêber Apo bang kir da ku bi riya siyasetê pirsgirêkê bên çareser kirin, ji ber ku gelê kurd ne aşiqê çekê ye, lê di heman demê de ne bi hêsanî wê çekê deynin, divê misogerkirina mafê gelê kurd di destûran de bê kirin. Dewleta Tirk bi hezarê salan dijminatiya gelê kurd dike, qet yekîtiya kurdan naxwaze û her dem hewil dide ku parçebûn di nava refên kurdî de çêbike."

**'Agirê azadiyê wê her bilind bibe'**

Sumeya Mihemed wiha li axaftina xwe zêde kir: "Di seranserî demên dirêj de, gelê kurd li hember siyasetên qirêj ji hêla dewletên ku xaka Kurdistanê dagir kir hate, ku bi hemû wesîleyan dixwestin wateya Newroz, berxwedan û îradeya gelan berovajî bikin. Mîraseya rasteqîn û dîrokî ya vê rojê Rêber Abdullah Ocalan zindî kir. Cejna Newrozê dîrokî û çandî ye, agirê ku Kawayê Hesinkar pêxist Rêber Apo şopand, ji ber vê yekê em vê rojê pîroz dikin da ku vê mîraseyê bi ruhê hevgirtina gelan zindî bikin."

Di dawî wî de Sumeya Mihemed wiha anî ziman: "Bi heman coş û kelecana ku me 8`ê Adarê pîroz kir bi peyama Rêber Apo, em ê Newrozê jî bi îrade û vîneke xurt pîroz bikin, bi regenkî cuda Newroza îsal cuda bikin, kêfxweşiya şahiyên xwe bi peyama rêber Apo temam bikin. Gereke em Newrozê bikin Newroza aştiyê û azadiyê. Agirê azadiyê wê her bilind bibe û bi saya berxwedan û hevgirtina gelan wê venemre heta bidestxistina azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan."

# Lehengên ku bi canê xwe, agirê Newrozê geş kirin

**Agirê Newrozê ku beriya hezarê salan li dijî zilma dehaqan hatî dadan, lehengên berxwedêr bi agirê bedena xwe geştir û gurtir kirin, bûn sembola serhildan û berxwedana li gelek deverên Kurdistanê û wateyek nû bi Newrozê dan qezenckirin.**

Birûc Resûl/Qamişlo

Di dîrokê gelek lehengên bûne malên dîrokê bi berxwedan û têkoşîna xwe. Di dîroka kurdan de jî Newroz bi berxwedan û têkoşîna ji bo parastina vîn û nasnameyê di rûpelên dîrokê de cih girt. Agirê Newroza ku bi hezaran sal in ji bo gelên Rojhilata Navîn bûye sembola têkoşîna li dijî zilmê, îsal jî bi riha vejînê gur dibe. Agirê Kawayê Hesinkar li dijî zilma Dehaq vêxistiye, bi 3 neftikên Mazlum Dogan pêxistine qet venemirî û heya îro her ku çû geştir bû. Li dijî qedexekirinên Newrozan û polîtîkayên asîmîlasyonê ji Mazlûm Dogan heya Sema Yuceyê gelek lehengên gelê kurd bi agirê berdane bedena xwe ve ala têkoşînê bilind kirin û heya îro ev ala têkoşînê qet nehat xwarê.

### Têkoşîna Mazlûm Dogan

Mazlûm Dogan di sala 1955'an de li gundê Teman a navçeya Depa Xarpêtê ji dayik bû. Dogan di sala 1974'an de qeyda xwe li Beşa Aboriyê ya Zanîngeha Hacettepe ya Enqereyê çêkir û di civînên Tûzlûçayir û Dîkmenên de Abdullah Ocalan û hevalên pê re bûn nas kir. Dogan piştre tev li xebatan bû, li Êlih, Amed û Rihayê têkoşîna azadiya gelê kurd da meşandin di 20 îlona 1979'an de li ser riya Êlih û Mêrdînê hate binçavkirin. Dogan ê bi nasnameyeke cuda ve hatiye girtin tevî hemû îşkenceyên jê re hatine kirin, nasnameya xwe ya rast eşkere nekir. Piştre nasnameya Dogan hate eşkerekirin û şandin Gîrtîgeha Hejmar 5 a Amedê. Dogan di vê girtîgehê de rastî îşkenceyên giran ên derveyî mirovahiyê ya îdareya leşkerî hat û li dijî polîtîkayên "Tirkkirinê" di 21'ê Adara 1982'yan de bi sê zilikên çixatê agir berda bedena xwe û Nowroz pîroz kir. Mezlûn Dogan bi vê yêkê kevneşopiyeke nû ya berxwedanê da destpêkirin.

### Zekiye Alkan bû meşaleya Burcê Sûrê

Piştî 8 salan 21'ê Adara 1990'an, Zekiye Alkan li ser sûrên Amedê bi dirûşma "Bijî Newroz" agir berda bedena xwe. Alkan di sala 1965'an de li gundê Akdag a navçeya Kelkîta Gumuşhaneyê ji dayik bû. Malbata Alkanê jî xizmên malbata Elî Şêr a di serhildana Koçgiriyê de pêşengtiya serhildana Koçgiriyê kiribû û hatibûn sirgunkirin in. Malbata Alkanê piştre koçî Îzmîrê kir. Zekiye di sala 1987'an de Fakulteya Tipa Zanîngeha Dîcle ya Amedê qezenc kir. Di 14'ê Adara 1990'î de li navçeya Stewra Mêrdînê 13 ARGK'ê jiyana xwe ji dest dan û pîrozbahiyên Newrozê hatin qedexekirin. Alkan a qedexe nas nekir, bi gotina "Newroz bi vêxistina agir tê pîrozkirin" agir berda bedana xwe û bû Newroz. Alkan a ji bo bibe bijîşk hatibû Amedê bi çalakiya xwe ve ji bo jinên kurd bû pêşeng û çavkaniya sirûştê. Rêber Abdullah Ocalan ji bo çalakiya Alkanê vê nirxandinê kiribû: "Çalakiya Zekiye Alkanê ya agir berdaye bedena xwe û agirê Newrozê bilind kiriye jî remza nehêsanbûna azadiyê ye."

### Çalakiya Ronahî û Bêrîvan deng veda

Ji jinên berxwedêr Ronahî (Bedrîye Taş) û Berîvan (Nîlgûn Yildirim) di heman çalakiyê de hatin cem hev. Ronahî di sala 1972'an de li navçeya Elbîstan a Mereşê ji dayik bûye. Ronahî keça malbateke welatparêz di sala 1979'an de tevî malbata xwe koçî Swîsreyê kiriye. Rohanî ku zarokê herî biçûk ê malbatê ye bi sê birayên xwe re li Swîsreyê komeke muzîkê ava dike. Birayên ku li ser têkoşîna azadiya Kurd stran gotin, piştî wefata bavê xwe dawî li xebatên koma muzîkê anîn.
Ronahî û Bêrîvan ên ku bi çalakiya di 22'ê Adara 1993'an de li bajarê Mannheîm ê Elmanyayê bi pêkanîn bedena xwe dan ber agîr, wek 'Şehîdên Newrozê' tên îlankirin. Çalakiyên wan hem li Kurdistanê hem jî li Elmanyayê bandorek mezin avadike. Dewleta Elman dixwaze kesên tevlî merasîma cenaze dibin asteng bike. Polîsên ku tundî bikartîne bi dehan kes binçav dike. Bi hezaran kes astengiya polîsan derbas dikin û bi merasîmeke girseyî Ronahî û Berîvan oxîr dikin.

### Canê xwe diyarî azadiyê kir

Di 22'yê 1992'yan de vê carê Rahşan Demîrel li Îzmîrê canê xwe diyarî azadiyê kir. Rehşan Demîrel a di sala 1975'an de li navçeya Nisêbîna Mêrdînê hatiye dinyayê bi temênê xwe yê biçûk ve li gel malbata xwe koçî Îzmîrê dike. Lê belê malbat gelek caran diçe serdana welatê xwe û zarokên xwe jî bi xwe re dibin da ku ji axa xwe veneqetin. Hêj ku Rahşan biçûk bû, zext û zordariyên dewletê yên ser nasnameya xwe hesiyabû. Lewma dema ku malbat cilan jê re distend her tim dixwest rengên kesk û sor û zer di nav de bin. Dema ku rojekê bi van cilên xwe yên kesk û sor û zer diçe dibistanê, mamoste şeqamek lê dixe lê Rahşan jî bi heman awayî nerazîbûna xwe nîşan dide. Rahşana ku serhildanên li bajarê xwê Nisêbîn û navçeya Cizîra Şirnexê ên salên 1990'î li Îzmîrê dişopîne, hêrs dibe û bi çalakiya xwe ve van serhildanan dibe Îzmîrê. Rahşan rojek berî Newroza sala 1992'yan astengkirina Newrozê ji kanalên televîzyonê hîn bû. Wezîrê Karên Hundirîn ê demê Îsmet Sezgîn wê demê wiha daxuyanî da: "Wê îsal Newroz neyê pîrozkirin. Yên ku pîroz dikin wê derbarê wan de çi hewce be were kirin."



### 'Ez ê xwe di Kadîfekaleyê de bikim Newroz'

Rahşan a hêj 17 salî bû piştî van daxuyaniyan di 22'yê adara 1992'yan de serê sibê ji malê derdikeve û diçe ser Kadefekaleyê. Berî ku ji malê derbikeve li ser perçeyeke kartonê wiha dinivîse: "Ez ê xwe di Kadîfekaleyê de bikim Newroz. Ez neçarim ji Newrozên Cizîr, Mêrdîn û Nisêbînê re bibim bersiv. Xwedî li min derbikevin. Ez xebarê didim Îsmet Sezgîn, wê Newroz were pîrozkirin. Bi lastîkê nebe jî em bi canê xwe bidin pîrozkirin!" Cenazeyê Rahşanê bi tevlîbûna 20 hezar kesan li bajarê wê Nisêbîna Mêrdînê hate veşartin. Agirê Newrozê yê Rahşan Demirelê li Kadîfekaleyê berdaye bedena xwe tax bi tax girseyîbûnê belavî Îzmîrê bû.

### Lehenga serhildêr Sema Yuce

Sema Yuce di sala 1971'an li Agiriyê hate dine, dibistana seretayî û lîseyê li Agiriyê xwend. Sema di sala 1987'an de Beşa Civaknasiyê ya ODTU'yê qezenc kir. li vê derê biryara tevlîbûna têkoşîna azadiyê da û di encama agahiyek sala 1992'yan de li Agiriyê hate binçavkirin û piştre jî hate girtin.
Belê ya ku bi azweriya azadiyê agirê Newrozê berdaye bedena xwe Sema Yuce bû. Sema ya ku bi gotina "Ez dixwazin ji 8'ê Adarê ber bi 21'ê Adarê bibim pirek ji agir" di 21'ê Adara 1998'an de li Girtîgeh Çanakkaleyê agir berda bedena xwe. Yuce ya piştî çalakiya xwe bi giranî birîndar bûbû, rakirin Nexweşxaneya Fakulteyê Tipî ya Cerrahpaşaya Stenbolê piştî 84 rojan di 17'ê hezîranê de bû nemir. Piştî ku Yuce jiyana ji dest da Hozan Serhat têkoşîna wê strana xwe ya bi navê "Keça Serhildanê ya Agiriyê" di dilê gelê kurd de bi cih kir.
Sema Yuce wiha got: "Yê ku dixwaze xwe bide têkoşîna azadiyê jinê û ji derdora xwe re dibêje "Birdoziya rizgariya jinê, bîrdoziya ku wê jinê ji xweliyên xwe ava bike ye". Piştî ku Yuce jiyana xwe ji dest da, di serî de ji bo jinên kurd, ji bo tevahiya jinên cîhanê bû mînak. Gelê kurd navê Sema Yuce li zarokên xwe kir û qet nede jibîrkirin. Her wiha navê Yuce di têkoşîna jinên kurd de jî bû sembolek.

### Li dijî zilma li ser Kurdan bedena xwe da ber agir

Berxwedana azadiyê ya jinên Kurd di Elefteria Fortulakî ya Yewnanî de jî nîşana xwe dibîne. Elefteria Fortulaki ya 23`ê salî, di 24`ê Adara 2006`an de li dijî rola Yewnanîstanê ya di komploya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û zextên li ser Kurdan de, li bajarê Atîna yê Yewnanîstanê li baxçeyê Dêra Aios Agios Milanos bedena xwe da ber agir. Elefterîa Fortulakiya ku bi birîndarî rakirin Nexweşxaneya Katê, di 27`ê Adara 2006'an de li beşa lênêrîna giran a nexweşxaneyê ku lê dihat dermankirin jiyana xwe ji dest da.

## Xwenasîn



### Roja nû, roja ronahî û azadiyê ye

Rohat Bulut

Di dîroka gelê Kurd de yek ji rojên girîng Newroz e. Ev roj ango Newroz gelek wateyên kûr ên xwezayî, civakî, çandî û bawerî di nav xwe de dihewîn e. Ji lewra jî wekî rojeke dîrokî û pîroz tê dîtin û her sal ji aliyê gelê Kurd ve wekî cejna azadiyê tê pîrozkirin. Ew roj ji bo gelê Kurd roja rizgariya ji bin zilma Dehaqe, ji bo xwezayê xwe nûkirin e, ji bo demsalê wekhevî ye. Gelek wateyên din ên vê rojê hene. Lê heke em di ser hin wateyan de vê rojê binirxînin û şîrove bikin ez bawerim dê ji rista xwe ya mîtolojîk wêdetir rastiya xwe ya civakî û têkoşîna her zindîwarî ya xwezayî li ber çavan şênber û zelal bibe.
Wateya Newrozê dikare bê berfirehkirin. Di wateya çandî, bawerî, dîrokî û civakî de ristên girîng dihewîn e. Di warê dualîtî de xwedî taybetmendiyên xwezer e. Newroz li dijî xirabiyê başî, li dijî tarîtiyê ronahî, li dijî teslîmiyetê berxwedan, li dijî koledariyê serhildêrî û azadî ye. Di wateya jiyaneke nû, rojeke nû, rizgariya ji bindestiyê, girtina serdemek tarîtî û destpêka serdemeke nû, di wateya afirîneriya giyanekî nû, nûjeniya xwezayê, xwe afirandin û azadiyê de dikare bê berfirehkirin. Roja nû ji bo Kurdan; Roja zayînê, roja destpêkeke nû, dîlgirtina kesê nebaş(ehrîmen), girtina heyameke tarî, destpêk, berxwedan, têkoşîn û roja azadiyê ye. Piştî van nirxan mirov dikare bibêje destpêka sala nû ye jî.
Di Newrozê de giyan û manewiyata ku ava dibe xwe digihîne hestên hezaran salan ên berxwedana li dijî zilmê. Ew berxwedan û têkoşîna bi rêxistinî ya di mîtolojiya ku ji aliyê Kawayê Hesinkar ve li dijî zilma Dehaq pêş ketiye, gelê Kurd her ji bo xwe kiriye çavkanî. Bi wê hestên rêxistinî û berxwedêrî her tim li dijî zilma Dehaq û Dehaqên her serdemê bi giyanê pêşeng ê Kawayên Hemdem derdikeve ser dika dîrokê. Lê belê em vî giyanê berxwedêr û têkoşîna azadiya civakê ya li dijî zilmê, bi zelalî di têkoşîna azadiyê ya Tevgera Azadiya Kurdistanê de dibînin. Bi taybetî jî di van 40 salên dawî di nav civaka Kurd de ev giyanê têkoşîna azadiya civakî û neteweyî derketiye holê û ji 7 salî heta 70'ê salî li dijî zilmê dadikevin qadan.
Ji ber ku gelê Kurd bi salan e têkoşîna azadiyê dimeşîn e, bi taybetî li Kurdistanê û bi giştî jî li seranserê cîhanê di 21'ê Adarê de dadikevin qadan û vê rojê pîroz dikin. Belê li aliyekî pîrozbahî ye, lê di heman demê de ew roja bi bîr anîna têkoşîna roja li dijî zilmê ye. Roja azadiya civakê ye, roja rizgariyê ye, û roja bi dawî anîna zilama Dehaqe, roja avakirina jiyana nû ye, roja nû û azadiyê ye, roja serfirazî û serkeftinê ye. Di heman demê de Newroz roja berxwedan û têkoşîna di her serdemê de li dijî zilmê û pergala koledariyê ye. Ji lewma jî ev roj ji bo gelê Kurd girîng e.
Di wê rojê de gelê Kurd gelekî kêfxweş e. Li her aliyê Kurdistanê bi beranameyên cihereng Newrozê pîroz dikin. Hin ji wan li serê çiyayên bilind, hin ji wan li gund û bajran vê rojê bi şêwazên cuda pîroz dikin. Lê remza Newrozê agir e û agir jî di baweriya Kurdan a resen de pîroz e. Agir, hem ronahiye, hem jî jiyan e. Ji bo me jî ya pêwîst têkoşîna ji bo rojên ronahî û azad e.



# Efrîn.. di navbera 7 sal ji qirkirin û vegera bi ewle de

**Îbrahîm Şêxo da zanîn ku bi derbasbûna 7 salan li ser dagirkirina herêma Efrînê ji aliyê dagirkeriya Tirk ve ku zêdetirî 800 hezar kes koçber bû. Kiryarên dijmirovî yên çeteyan û siyaseta guhartina demografîk hîna jî tê domandin.**

Esma Mistefa/ Qamişlo

Li ser dagirkirina herêma Efrînê ya Rojavayê Kurdistanê ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê û komên çeteyan ve 7 sal derbas dibin. Dagirkeriya Tirkiyê di 18'ê Adara 2018'an de Efrîn bi temamî dagir kir. Têkildarî kiryarên dagirkeriyê û vegera bi ewle ya gelê Efrînê Îbrahîm Şêxo bersiva pirsên rojnameya me da.

**Bi hatina heftemîn salvegera dagirkirina Efrînê, her cure binpêkirin jî hê berdewam in. Metirsiyên ku jiyana sivîlan li wir û pêşeroja bajêr bi giştî dixe metirsiyê çi ne?**

7 salin li ser dagirkirina Efrînê re derbas dibe û heyanî vê kêliyê jî sûcên dijmirovî û kiryarên komên çeteyan derheqê gelê Kurd û tavahî herêmê de têne pêkanîn. Heyanî niha jî komên çete yên bi navê artêşa netewî yê girêdayî Tirkiyê ku weke opozisyon têne naskirin, cûcên dijmirovahiyê dikin. Helbet ev hêz ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê ve têne bikaranîn da ku berjewendiyên xwe di Sûriyê de biparêze.
Di 7 salan de li Efrînê hemû cûreyên binpêkirinê ji kuştin, revandin, îşkencekirin, talankirina sererd û binerd, guhartina demografîk, qutkirina dar û daristanan, şewtandin, bace ferizkirin, herwiha hewildana qirkirina nasname û rengê gelê Kurd li wir tê kirin. Ev hemû jî xeterî bûn li ser gelê kurd di Efrînê de dihate jiyankirin û hê jî berdewam e. Helbet bi hemdemiya van kiryaran re metirsî û xeteriya herî mezin li ser nasnameya etnîkî û dîrokî ya gelê herêmê heye. Bi van kiryaran û sûcên dijmirovî dixwazin Efrînê ji cewherê wê derxînin. Bi guhartina demografîk û bicihkirina xelkên biyanî û bi avakirina kampên mêtîngeriyê dixwazin Efrînê ji cewher de bidin guhartin. Helbet ev yek jî nayê qebûlkirin û xebatên berfireh derbarê van mijaran de hatine kirin.

**Bi geşedanên dawî û dagirkirina herêma Şehbayê re, tundiya binpêkirin û tawanan zêde bûye. Vîdyoyên ku me li nexweşxaneya Avrîn û deverên din dîtin, baştirîn belgene. Hûn van kiryaran çawa dinirxînin?**

Bi taybet bi guhartinên dawiyê yên ku di Sûriyê de hatine dîtin re di destpêka Kanûna 2024'an de HTŞ'ê berê xwe da herêma Şehbayê jî û gelê Efrînê careke din di qonaxa koçberiyê re derbas bû. Ev gel berê xwe dan herêmên Rêveberiya Xweser yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Zêdetirî 100 hezar kes derbasî van herêman bûn. Bê guman komên çekdar yên ku derbasî Şehbayê bûne cardin li ser gel komkujî pêkanîn û gelek welatiyên Efrînê û Şehbayê girtin û qetilkirin.



Bi ketina van hêzên çekdarî re, binesaziya ku di demên Rêveberiya Xweser de li gorî pêdiviyên gel û herêmê hatibû sazkirin. Piştî ketina komên çeteyan hemû mal û cihên fermî hatin talankirin. Ev yek jî bi dîmen li ser medya civakî dihatin belgekirin. Herî dawî Nexweşxaneya Avrîn bi giştî hat rûxandin. Ev yek jî zihniyeta wan ya talankirin û xirabkirinê dide nîşandan. Herwiha me dît ku çawa kesên bê sûc girtin, yek ji wan jî welatiyê Efrînî yê ku li Til Rifetê dima hemû cûreyên îşkenceyê bi qutkirina tiliyên lingan her wiha bi lêdana ku li wî hatiye kirin. Gelek ji van bûyeran bi destê komên çete têne berdewamkirin. Herêm bi giştî bûye herêmeke wêrankirî û dagirkeriya Tirkiyê berpirsê hemû sûc û kiryara ye.

**Di derbasbûna heft salan li ser dagîrkirina Efrînê re, we çi kar ji bo belgekirina tawanên dagirkeriyê kiriye û helwesta raya navdewletî derbarê van tawanan de çawa ye?**

Di hundir 7 salan de çawa ku komên çeteyan derbasî Efrînê bûn û dagirkeriya Tirkiyê serweriya xwe îlan kir, em jî Rêxistina Mafê Mirovan kêlî bi kêlî tavahî sûcên ku li wir dihatin kirin, bi dîmen, çavdêrî, şahidên kiryarên ku hatine kirin, agahî û bi şopandina ji hundur û derve de; me belgekirin û ji hemû aliyên têkildar re şandin û eşkere kirin. Bi taybet jî mijara kampên mêtengeriyê de ku zêdetirî 47 kamp hatine avakirin.

**Daxwazên berdewam hene ji bo vegerandina bi ewle ya koçberan, berpirsiyariya rayedarên peywendîdar ji bo dabînkirina vê yekê, û pêwîstiya bidawîkirina dagîrkerî û binpêkirinan çi ye?**

Zêdetirî 4 hezar malbatên Efrînê di van demên dawiyê de piştî ketina rêjîma Esed û serweriya HTŞ', vegeriyan Efrînê. Malbatên biyanî yên ku ji aliyê komên çeteyan ve di malên xelkê resen de bi cih bûne, rênadin ku malbatên Efrînê bikevin malên xwe. Heyanî niha jî ev gel di malên nasên xwe de dimînin. Her wiha gelek kes bi tewanên ku ew girêdayî Rêveberiya Xweserin û PKK'ê ne hatine girtin û heyanî niha jî çarenûsa wan ne diyar e. Helbet piştî ewqas êş û zehmetiyên ku gelê me jiyan kiriye, bi geşedanên dawiyê re hêviya gel ewe ku vegereke bi ewle û bidawîkirina dagirkeriya Tirkiyê dixwazin. Divê em bizanibin tu cihê dagirkeriya Tirkiyê li ser xaka Sûriyê nîne û ew dewletekî dagirkere ku armanca wê qirkirina gelê Kurd e. Li aliyê din em dixwazin ku Efrîn vegera nasname û çanda xwe ya kurdî. Li ser wê esasê jî divê Raya Giştî li hember van binpêkirinan û bi taybet li hember Tirkiyê bê deng nemîne.

### Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Sûriye kiryarên dagirkeriyê ya 7 salan wiha eşkerekirin

Bi dagirkirina Efrînê re piştî ku zêdetirî 800 hezar ji hemwelatiyên Efrînê yên resen bi darê zorê koçber bûn. Zêdetirî 700 hezar kes ji deverên cuda ji Sûriyê li hemû navçe û gundewarên Efrînê bi cih kirin. ku zêdetirî 500 malbatên Ereb yên Filistînî 48 bi cih bûn. Rêjeya Kurdan li Efrînê niha ji çaryekê derbas nabe, ango kêmtirî %23, di mezintirîn guhertina demografî ku Sûriyê ji destpêka krîza sala 2011an de dîtiye.

### Guhartina demografî

Çawa ku dagirkeriya Tirk ev 7 sal in ku bi guhertina navên kolan, qadan, nexweşxane û navendên giştî hewl dide nasname û şûnwarên Efrînê biguherîne û bi nasnameya Tirkî re bike yek. Herwiha bilindkirina ala Tirkiyê li ser dibistan û dezgehên giştî, di nav de guherandina navê çarxereya Newrozê bi Selahedîn û piştre bi temamî hat rakirin. Bi vê yekê re navên cihên stratejîk û Kurdistanî bi navên Osmanî hatin guhertin, li her derê û li her gund, navçe û navenda bajaran ala tirk û wêneyên Erdogan hatin danîn. Herwiha zimanê xwendinê di dibistanan de bû zimanê Tirkî. Di heman demê de dagirkeriya Tirk destwerdana cihên pîroz kir û şûnwarên olî yên Êzidiyan li gundên Êzidiyan wêran kir.
Dagirkeriya Tirkiyê ji bo temamkirina pêvajoya guhertina demografîk, neçar kir ku nasnameyên Tirkiyê bidin sivîlên Sûriyê yên li nav axa Sûriyê ku ew dagir dike. Betalkirina danûstandinên bi diravê Sûriyê û li şûna wê pereyê Tirkiyê bikaranîn. 64 dibistan bi qismî yan bi temamî hatin wêrankirin û zêdetirî 50 hezar xwendekar ji xwendinê bêpar man û hin dibistan ji wan jî veguherandin navendên leşkerî û navendên binçavkirin û îşkenceyê.

### Kampên mêtîngeriyê

Avakirina zêdetirî (48) kampên mêtîngeriyê, ku yên herî diyar ev in (Kuweyt El-Rahma, gundê El-Şamiye û gundê Basma). Piştgiriya van kampan bi rêya komeleyên Tirkî, Qeterî û Kuweytî (Komeleya El-Beyan a Qeter-Tirkî, Komeleya Filistînê ya bi rûmet 1948, Komeleya Xêrxwazî ya El-Ihsan û hwd.) re bû.

### Kuştin

Di derbarê bûyerên kuştinê de, zêdetirî (764) sivîl hatin kuştin, ji wan (614) di encama bombebarana Tirkiyê û komên girêdayî wê de hatin kuştin. (96) di bin îşkenceyê de hatin kuştin. Her wiha zêdetirî (700) birîndar jî di encama bombebarana Tirkiyê û çeteyên girêdayî wê de hatin belgekirin. Di nav wan de nêzîkî (335) zarok birîndar bûne û (220) jin.

### Girtin û Revandin

Di vî warî de di heyama 7 salan de zêdetirî 10 hezar û 11 sivîl dîl hatin girtin. Heta niha jî çarenivîsa nêzîkî çaryekê ne diyar e û bi hezaran ji wan di berdêla dayîna pereyan de hatine berdan.

### Rewşa jin di Efrînê de

Derbarê rewşa jinên Efrînê de, (115) bûyerên kuştinê hatine tomarkirin, ji wan (17) bûyerên xwekuştinê ji aliyê jinan ve û (74) destdirêjiya cinsî ne. Herwiha Zêdetirî hezar jin hatin revandin û rastî îşkenceyên fizîkî û derûnî hatin, di nav de tundiya zayendî û keçên temen biçûk.

### Qutkirin û şewitandina daran

Zêdeyî 510 hezar ji darên Zeytûn û darên din ên daristanan hatin birîn ji bo bazirganiya bi êzingan. Herwiha zêdeyî 26 hezar darên zeytûnan û darên curbecur ên daristanan hatin şewitandin. Zêdetirî sêyeka rûbera ku ji bo çandiniyê hatiye veqetandin, ku zêdetirî (12) hezar hiktar e ji aliyê dagirkeriyê ve hatiye şewitandin.

### Dizîna berhemên zeytûnan

Dibe ku ziyana madî ya herî girîng jî operasyonên talankirinê yên ku ji aliyê çeteyên dewleta Tirk ve tên kirin, desteserkirina berhemên zeytûnan û derbaskirina wê di deriyê sînor ê gundê Hemamê yê navçeya Cindirêsê re ji bo Tirkiyeyê. Ev derî di sala 2019'an de ji aliyê dagirkeriya Tirk ve hate vekirin ji bo hêsankirina pêvajoya derbasbûna zeytûnên dizî û firotina wê li bazarên cîhanê yên wekî Ispanya û Amerîkayê. Divê em ji bîr nekin ku ji 7 salan ve bace ji aliyê komên çeteyan ve li ser xelkê resen di mewsima rakirina berhemên zeytûnan de tê ferizkirin. Sala herî dawî wiha bû sepandina mûçeyan li ser xelkê di encama çinîna zeytûnan de di navbera (20-30) dolaran de ye. 4 hezar û 500 teneke zeytûnê li ser gundên Meydana ya navçeya Racoyê ku li ser 900 malên welatiyên Kurd ferz kir. Li gundê Kamrûkê ya navçeya Mabata zêdeyî 250 hezar dolar hat sepandin û 60 hezar Dolarê Emerîkî li ser 6 gundên navçeya Şiyê sepandin û tenê ji bo gundê Qermîtliq ya Şiyê 70 hezar dolarê Amerîkî li ser hemwelatiyan hate sepandin.

### Talankirina şûnwarên dîrokî

Piraniya şûnwarên arkeolojîk ên ku di lîsteya UNESCO de cih digirin, di dema êrîşên li ser Efrînê de hatin wêrankirin. Wek "Perestgeha Ain Dara, Nabî Horî, Şikefta Doderî, Tirba Mar Maron" û gelek cihên din ên arkeolojîk. Li herêma Efrînê nêzî 75 girên arkeolojîk hene. Zêdetirî (59) şûnwar û girên şûnwarî hatine wêrankirin. Zêdetirî 28 mezargehên olî ji bo mezheb û olên curbecur, ji bilî wêrankirina gelek goristan û yek ji wan veguherandina bazara heywanan.

# Guhertina çarenûsa gelan a dîrokî Banga Aşitî û Civaka Demokratîk e

Rojnamevan Sînan Cûdî ragihand ku pêwîst e di vê pêvajoyê de Rêber Apo tenê neyê hiştin û wiha got: “Rêber Apo ev banga dîrokî ji bo serxwebûna hemû gelên azadîxwaz kir, lewma jî divê destê Rêber Apo bê xurtkirin.”

**Argêş Vîyan/ Qamişlo**



27’ê Sibata 2025’an cîhanê li banga dîrokî ya Rêber Apo guhdar kir. Li çar aliyên Kurdistanê bi sed hezaran mirov ji bo dîtin û guhdarkirina Rêbertî li hev kom bûn. Her çi qas dewsên salên tijî berxwedan û êş di rûyê Rêbertî de xwe nîşan diba jî, lê hêz û biryardariya wî ji çavên wî xuyadibû. Bê guman ji bo gelê me û dildarên PKK’ê dîtina Rêbertî cihê kêfxweşî û şanaziyê bû. Di esasê xwe de ev ne tenê peyamek bû. Nirxandina dîrokekê û perspektîfeke siberojê bû. Gelek fikrên hişk diba ku naveroka vê peyamê cuda nirxandibe, ango gelek hene ku hewl didin û wê hewl bidin peyamê li gorî fikir û berjewendiyên xwe şîrove bikin. Derheqê nameya Banga Aşitî û Civaka Demokratîk ya Rêberê gelan Rêber Abdullah Ocalan de, rojnamevan Sînan Cudî ji rojnameya me re axivî.

**‘Ev Bang, banga hişyarbûna gelên demokrasîxwaz e, û gelek caran ev hewildan hatin kirin’**

Rojnamevan Sînan Cudî di derheqê nameya Rêber Apo ya 27’ê Sibata 2025’an de da diyarkirin ku destpêkirina pêvajoyekê nû ya gelan bû û wiha axaftina xwe destpêkir: “Banga aşitî û civaka demokratîk hewildanên Rojhilata Navîn de ya dîroka nêz ve çareseriya pirsgrêka herî bingehîn ya cîhanê mirov dikare bi nav bik e . Gelek sedemên bingehîn hene ku ji bona ev peyam ji aliyê Rêberê gelan Rêber Abdullah Ocalan de, hat dayin hey e. Ev guhertina paradigmayekê nû û derfeta pêşxistina sîyaseta demokratîk e. Ji sala1977’an ve destpêkê hêzên çepgir û ciwanên zanîngeha hatin rêxistinkirin û li ser vî bingehî jî tevahî civaka Kurd dane naskirin. Armanca herî bingehîn ev bû ku pirsgrêka Kurd bi cîhanê bidin naskirin û bikarin wê pirsgirêkê çareser bikin, Xala duyemîn jî ew bû ku ji bona demokratîkkirina Tirkiyê ciwanên zanîngehan rêxistin bike û çareseriyekê mayinde bidin peydakirin. Di heman demê de jî gelek rêxistinên Kurdî jî, xwe di nav civakê de rêxistin dikirin û hewildan kirin ku ji wê pirsgrêkê re çareseriyekî peyda bikin. Di 18’ê Gulana 1977’an de li Dîlokê ji aliyê Eladîn Kaplan endamê rêxistina sîxur ya bi navê Stêrka Sor ve hat şehîd kirin. Bi şahadeta şoreşgerê mezin Heqî Karer re biryara guhertina têkoşînê hat dayin û girêdayi wê biryarê 27’ê Mijdara 1978’an de li Amedê gundê Fîsê PKK’ê hat avakirin û ev pêngav gelê ku di nava qirkirineke piralî de jiyan dikir, têkoşîna vê derxiste asteke din. Heya sala 1980’an ev serdem weke xweparastinê hat meşandin. Darbeya ku ji aliyê Serfermandarê artêşa Tirk yê wê demê Kenan Evren ve di 12’ê Îlona 1980’an de hate kirin de mafê ti gelên ku jiyan dikin li ser axa Tirkiyê nehiştibû û Kurdistan careke din hate dagirkirin. Ji mirovan û fikrên cuda re mafê axaftinê jî ne hat hiştin û li gorî wê jî siyaseta qirkirin û tinekirinê li ser gel û tevgerên azadîxwaz hatin meşandin. Ev zexta ku taybet li ser gelê Kurd tê meşandin hişt ku Tevgera Azadiyê têkoşîna xwe biguhere û bikeve nava paradîgmayeke nû. 15’ê Tebaxa 1984’an de PKK’ê derbasî şerê çekdarî bû û heya sala 1993’an ev serdem hat domandin. Rêber Apo di sala 1993’an de agirbest xiste rojevê û yekalî agirbest hat ragihandin. Rêber Apo di wan deman de jî anîbû li ser ziman û wiha gotibû “Pirsgirêka me ya yekem ew e ku guhertina hişmendiya komara Tirk e, ev jî encex bi destûra bingehîn pêkan e.” Lê wê demê jî ev hewildanên Rêber Apo yên çareseriyê bi şewazekî tûndî hat tepisandin û Tevgera Azadiyê kete nav pêvajoyeke şer û parastin ê. 17 Nîsana 1993’an de Serok Komarê Tirkiyê ji aliyê kesên nenas ve hate kuştin û ji ber wê jî pêvajo hat guhertin. Ev stratejîya Rêber Apo di salên 1980’an de ya bi navê “Şerê gel yê demdirêj”ji 1998 ’an de dîsa bi ragihandina agirbestekî din hat guhertin. Dîsa jî Rêber Apo derfet da dewleta Tirk û rayedarên wî ji bona pirsgirêka Kurd bi riya demokrasî û azadiyê çareser bibe. Dîsa careke din bi komploya 9’ê Cotmeha 1998’an ve ev hewildanên Rêber Apo hatin vala derxistin û 15’ê Sibata 1999’an de Rêber Apo ji aliyê hêzên kûr û veşartî ve hate revandin û radestî dewleta Tirk hate kirin. Ev nêzî 26 salin ku Rêber Apo di bin tecrîdeke girankirî de û li navenda işkenceya girava Imraliyê de tê girtin.”

**‘Banga Rêber Apo derfeteke dîrokî ye, pêwîste neyê derbaskirin’**

Sînan Cûdî da bibîrxist ku ev pêvajoya ku gelê Kurd tê re derbas dibe dîrokî ye û wiha domand: “Piştî kongireya 7’emîn ya PKK’ê stratejîya şerê gel yê demdirêj hat guhertin û şûna wê sîyaseta têkoşîna demokratîk hat danîn û şerê çekdarî dîsa kete rêza 2’emîn. Lê dewleta Tirk xwedî hişmendîyeke nijadperest e, û ev yek jî vala derxist. Di kongireya 8’emîn de jî li ser vê yekê jî hat nîqaşkirin, navê PKK’ê hat guhertin û di şûna wêde KADEK hat kirin. Lê dewleta Tirk hewildanên Rêber Apo yên 1993 û heya sala 2015‘an de jî, ji nedîtî ve hat û pêvajo xistin tengasiyê. PKK’ê li ser bingehê pêşengtiya bîrdozî û têkoşîna gelê bindest ava bû. Ev têkoşîn û berxwedana bêhempa destê Rêber Apo xurt kir û neçar man ku bi Rêber Apo re hevdîtinan bidin destpêkirin. Di encama têkoşîna 27’ê Sibata 2025’an de Rêber Apo bi navê “Banga Aşitî û Civaka Demokratîk” nameyek şand û bang ji bona hemû aliyên peywendîdar kir û ev jî derfeta dawiyê ya ji bona hikûmet û rayedarên Tirke ye. Pêwîste hemû alî û derdorên ku bi pirsgirêka Kurd ve mijûl dibin, serdem û hewildanên Rêber Apo baş şîrove bikin û bi rengekî rexnedayin nêzî vê pêvajoyê bibin. Ji ber ku ev serdem û pêşketinên tên jiyan kirin hebûn û tinebûna gelan e û pêwîste gel bi tinebûnê re rûbirû neyê hiştin. Li Rojhilata Navîn û bi taybet jî li Kurdistanê alozî û gengeşe weke qedera gelan hatiye dîtîn, lê berovajî wê navenda çanda jiyana demokratîk û komînal e. ev kevneşopî û ezmûn li Kurdistanê hatiye jiyankirin, niha jî Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê dîtin. Ev bang bangeke dîrokî ye destpêkirina serdemeke nû ya azadiyê û aşitî yê ye û di heman demê de xirakirina lîstokên qirêj yên hezar sala ne.”

**‘Ev bang ne lihevkirineke di navbera du aliyan da ye, pêşxistina têkoşînê gihiştina serdemekê ye’**

Cûdî diyar kir ku divê mirov ji rêzê nêzî pêvajoyên wisa nebe û wiha anî li ser ziman: “Rêber Apo bi wê banga xwe jî, hewildan dike ku dewleta Tirk bîne li ser rêya çareserî û demokrasî yê. Dewleta Tirk ya dagirker dîsa bi riya siyaseta îmha û qirkirinê hewil dide ku derfetên heyî ji holê rabik e. Herwiha dixwaze di navbera Tevgera Azadiyê, gel û Rêber Apo de valahî bide avakirin, ji bona ku ev pêvajoya heyi bi ser nekeve. Dîsa hewildide serdema heyi berû şer û êrîşan ve bibe û pir caran bi rêya rayedar û dezgehên xwe yê şerê taybet vê yekê dik e. Ev şerê derûnî û taybet ji bona raya giştî bandor bike û hin derewan bide bawer kirin van kiryaran jî dide meşandin. Bi riya girtin, zextan ji bona dengên cuda dernekevin dike. Ev agahî pêwîste neyê jibîrkirin ku dewleta Tirk ya dagirker ti caran ne yekalî ye û baskekî wan heye dixwaze çareserî pêk bê, aliyekê din jî yê nîjadperest heye xwe bi şer û xwînê li ser piyan digir e. Pêwîste em taybetmendî, şêwaz û xisletên di nav wan de baş nas bikin, pêwîste em tiştekê ji dewleta Tirk bi rengekî hêsanî hêvî nekin û li gorî banga dîrokî ya Rêber Apo guhertin û veguhertinê pêkbînin.”

**‘Ger ku ev pêvajo serkeftî nebe, dê cîhan bikeve nav şerekî pir giran’**

Sînan ragihand ku ev pêvajo dê bandorekê li pêşketinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî bike û wiha qedand: “Rêber Apo vê pêvajoyê bi du serdeman bi nav dike; aliyê sîyasî û zagonî. Ji bona wê jî hewcedariya guhertina paradîgmaya kevin hey e. Ev paradîgma kevn ya di bin sîwana dewlet netew de tê meşandin pêwîste ji binî ve were guhertin. Pêwîste ne tenê dewleta Tirk em bidin guhertin pêwîste em bi hemû hişmendiyên dewletparêz re têkoşînê xurt bikin. Çareserî û encama wê jî Rêber Apo dide pêşiya me û divê em jî civakê bidin fêmkirin. Qirkirin û tinekirina Kurdan bi peymanên Sykes Pîcot, Sewir, Lozanê destpêkir û Kurd kirin beş beş. Pêwîste ji bona çareseriya pirsgirêka Kurd NY zext di asta cîhanî de li ser dewleta Tirk û dewletên din yên desthiladar bê kirin. Ji ber ku ev pirsgirêk ne tenê di navber hikûmeta Tirk û Tevgera Azadiyê de ye, ev pirsgirêk gerdûnî ye pêwîste demildest bê çareserkirin. Pêwîste em tenê bar li ser milê Rêber Apo nehêlin, em hemû bi erk û berpirsyariya ku dikeve ser milê me bi cî bînin û destê Rêber Apo xurt bikin.”

## HTŞ’ê nikare ezmûnê derbas bike!



**Dilyar Cizîrî**

Heyet Terîr El-Şam (HTŞ) di nava çend rojan de gihiştin paytexta Sûriyayê Şamê. Ebû Mihemed El-Colanî ku yek ji kesayetên herî xeternak ê cîhadîste, li şûna Serokê berê Beşar El-Esed rûnişt.

Di nava çend saetan de kerafêt û cilên siyasetmedarên moderin li xwe kir û navê xwe wekî Ehmed El-Şeri aşkere kir. Şande û serdan ji gelek welatên cîhanê çêbû. Piraniya ragihandinên cîhanê û yên ereban piropogandeyek wiha kirin El-Şeri dê gelê Sûriyê bighîne çareseriya demokratîk.

Piraniya welatên cîhanê gotin Ehmed El-Şeri di ezmûnê de ye, ka rast dikare xwe biguhere û serkêşiya dema veguheztinê bike, yan na?. Lê Colanî ji gavên xwe yên destpêkê diyar kir ew ê nikaribe bibe Ehmed El-Şerê aliyên derve û hundir jê hêvî dikin.

Lê Colanî li şûna hemû aliyên Sûriyê bixe nav rêveberiyê û bi cihkirina xalên veguhertina demokratîk, her kes dûrî xwe kir û nîşan da ku armanca wî desthilatdariye. Rayedar û hikûmeta demkî ji endamên HTŞ’ê erkdar kir. Mirov dikare tenê bibêje ku Idlib anî Şamê û rêveberiya Sûriyayê, radestî Idlibê kir. Ji van gavan roj li pey rojê diyar dibû, Colanî rê nade Ehmed El-Şerê derfet jê re hatiye vekirin.

Piştî demek din gotin Kongreya Niştimanî amade dikin, bêyî tu aliyan dawet bikin, hin alîgirên xwe û çend kesên berê ji rêjîma Baas re li defê didan kom kirin û îda kirin wan “Kongreya Niştimanî ya Sûriyayê” lidar xistiye. Kongreya wan rastî nerazîbûna piraniya gelê Sûriyayê bi pirengiya wê hat.

Ne Dirziyê li Siwêda xwe rêxistin kirin û rêveberiya amade kirine, ne kurd û pêkhateyên din ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên Rêveberiya Xwe ya Xweser ava kirine, kongeya wan qebûl ne kirin. Ne Elewî, ne Ismalî, ne jî siniyên ilmanî kongreya wan ji aliyê kesî ve ne hat qebûlkirin.

Bi taybet çekdarên HTŞ’ê ku bi hezaran çeteyên biyanî di nava wan de bûn, li dijî gelê Sûriyê bê rêzî kirin. Bi taybet li dijî Elewiyên Perava Sûriyê. Li dijî tevgera çekdarî li Peravê hate kirin. Hejmarek çekdarên wan hatin kuştin û gelek herêm ji destê wan hatin derxistin. Colanî û rayedarên ji aliyê wî ve hatine erkdarkirin, bang li çeteyên xwe kirin û li dijî Perava Sûriyê êrişeke hovane dan destpêkirin. Bi hezaran sivîlên elewî qetil kirin. Dîmenên pir bi êş û hovane parve kirin. Piştî komkujiyê bi fermandarê QSD’ê re peymana ji 8 xalan imze kir. Gelek aliyan wiha hêvî kirin ku El-Şeri dixwaze ji Colanî rizgar bibe. Lê piştî wê bi 2 rojan destûra dema veguhestinê ya ji bona 5 salan imze kir. Hema bêje kopyek ji destûra rêjîma Baas a berê bû. Careke din inkara, yekrengî û desthiladarî serwer bû. Li aliyê din li dijî êrişên dewleta Tirk û komkujiyên li dijî sivîlan pêk tîne, wekî komkujiya Berxbotana Kobanê ku di encamê de 7 zarok, dayîk û bav şehîd bûne, nikare tu helwestekî li dijî dewleta Tirk nîşan bide.

Di encamê de di nava çend mehên serweriya xwe de Colanî roj li pey rojê isbat dike, ewê nikaribe Sûriyaya nû ya piştî rêjîma Esed birêve bibe.



# ‘Bi destûrekî wiha desthilata Şamê kete şaştiyek mezin’

Rêveberê Navenda Çav a Rapirsînan, Silêman Ilyas diyar kir ku bi derxistina destûrekî bi vî rengî desthilata Şamê şaştiyeke mezin kir û got, “Destûr nûnertiya hemû gelên Sûriyê nake û nayê zanîn eger wê ev destûr demkî yan mayînde be.”

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Di 13’ê Adarê de desthilata Şamê wesîqeya destûra Sûriyê bêyî ku bi hemû pêkhate, rêxistin, partî û hwd… re bicive, ragihand.

Wekî tê xuyakirin ev gav nimûneyek ji çêkirina sîstemeke navendî, li dijî mafê hemû pêkhateyan, bawerî, bîrdozî û jinan bû. Lewma jî piranya gelên Sûriyê nerazîbûna xwe li dijî destûra ku hat sazkirin, bi xwepêşandanan, raber kirin.

Derbarê heman mijarê de rêveberê Navenda Çav a Rapirsînan, Silêman Ilyas ji rojanameya me re axivî.

**‘Em nizanin ev destûr demkî ye yan mayînde ye!’**

Ilyas diyar kir ku nayê zanîn eger wê ev destûr demkî yan mayînde be û wiha pê dede çû: “Desthilata Şamê ya nû bêyî ku diyalog û civateke hevbeş di navbera hemû gelên Sûriyê de çêbike, destûrek ragihand. Di serî de hat destnîşankirin ku divê ola serokê Sûriyê mislmantî be bêyî ku guh bi nasnameya niştîmanî were dayîn, hem jî serok hemû biriyaran erê dike û red dike, tu kes nikare hesab jê bixwaze. Herwiha meclisa gel hat avakirin bêyî ku nûnertiya hemû gelan bike, desthilata Şamê ne civînek bi gelên Sûriyê re çêkir û ne li nêrîna gelan guhdar kir. Bi derxistina vî destûrî desthilata Şamê şaştiyeke herî mezin kir, heya niha tu kes bi rengekî êrînî nêzî vî destûrî nebûye. Destûra nû tu eleqeya wê bi Rêveberiya Xweser û pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê re tuneye ji ber ku ne li gorî daxwazên gelên Sûriyê ye. Niha desthilata Şamê dibêje ev destûr ji bo qonaxa serweriya demkî ye. Temenê vê qonaxê jî 5 sal e, temenê wê gelekî dirêj e, ev cara yekem e ku destûrek bi vî rengî tê sazkirin, tu kes nizane ku ev destûr demkî ye yan mayînde ye.”

**‘Hemû gavên desthilata Şamê yên demkî ne rewa ne’**

Silêman destnîşan kir ku hemû xebatên desthilata Şamê yên demkî ne zagonî ye û wiha domand: “Ji destpêka ku HTŞ’ê rêvebirina Sûriyê girte destê xwe, xebateke yekalî dide meşandin. Tevahiya xebatên ku ev desthilatî dike ne rewa ne. Di destpêkê de destnîşankirina serokê demkî ji bo Sûriyê; ev yek jî bêyî ku hilbijartin û nêrîna gelan bê girtin pêk hat, li aliyekî din komîteyek ji bo lidarxistina kongreyê niştîmanî hat avakirin bêyî ku hemû pêkhateyên Sûriyê cihê xwe di nav wê de bigirin. Di heman demê de desthilata Şamê bi beşdarbûna çend kesên li gorî hişmendiya xwe kongreyek li dar xist. Em tekez dikin ku hemû xebata ku desthilatdariya Şamê dide meşandin, ne li gorî îrade û nêrîna gelên wê ye û ew bi heman hişmendî û rêbazê rêjîma Baasê tevdigere.”

**‘Sîstema Rêveberiya Xweser ji bo gelên Sûriyê guncav e’**

Rêveberê Navenda Çav a Rapirsînan, Silêman Ilyas tekez kir ku sîstema Rêveberiya Xweser ji bo gelên Sûriyê sîstema herî guncav e û wiha axivî: “Piştî derxistina destûrê nû gelê Siwêda nerazîbûna xwe li hember raber kir û wan tekez kir ku ev sîstem ji bo wan ne guncav e. Em jî didin tekezkirin ku wê destûrê nû bê encam bimîne û wê ji bilî parçebûna



Sûriyê, şerê navxweyî û pêkhatina tevlîheviyê tu encamên din bi xwe re neyîne holê. Egera pêkanîna şerê navxweyî jî wê bi destê dewleta Tirk pêk were, ji ber ku ew herî zêde destwerdanê di kar û barên Sûriyê de dike. Îro hemû gelên Sûriyê li dijî vî destûrî ne ji ber ku ne wan saz kiriye. Di dema heyî de sîstema navendî nema guncav e ji bo Sûriyê, lê sîstema guncav ji bo tevahiya Sûriyê, pêkanîna nenavendbûnê û Rêveberiya Xweser e. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hemû pêkhate xwe bi rê ve dibin û mafê hemû gelan ê çandî, rêvebirinê, siyasî û hwd parastî ye. Lewma jî divê destûrek giştî li gorî daxwazên gelên Sûriyê bê sazkirin ku hemû pêkhate xwe di hundirê vî destûrî de bibînin, di encamê de Sûriyeke pirreng û demokras ava bibe.”

## Demokrasî wê Sûriyê bike yek û rê jêre veke



**Zekî Bedran**

HTŞ’ê tevî peymana ku bi nûnerên Rêveberiya Xweser re îmze kiribû jî, zext û qirkirina xwe ya li dijî Elewiyan didomîne. Li gorî peymanê dê li seranserê Sûriyê agirbest bê ragihandin. Weke ku tê dîtin HTŞ’ê hewl dide peymanê li gorî berjewendiyên xwe şîrove bike û bi cih bîne. Ne guncaw e ku bibêjin em bi vê peymanê tenê aliyê QSD’ê muxatap digirin. Jixwe di navbera wan û QSD’ê de agirbest hebû û heta niha ti pevçûn çênebûye. DYA û hêzên din ên rojavayî yên ku dixwestin ev peyman bê îmzekirin û bi HTŞ’ê re peywendiyên xwe didomînin, ji şermezarkirina komkujiyên Elewiyan û hişyarkirinê pê ve tiştek nekirin. HTŞ niyet û nasnameya xwe ya rast eşkere kir. Hat dîtin ku gotinên wan ên weke “em hatine guhertin, her kes wê bigihê mafên xwe, ti pêkhate û netew tine nabe” wê rastiyê nîşan nadin. HTŞ’ê pir berjewendîperest tevdigere û dem bi dest dixe û gav bi gav serweriya xwe ava dike. Di bingeha xwe de HTŞ’ê da xuyakirin ku ew xwedîyê bikare hişmendiya ku yekkirin û rêvebirina Sûriyeyê de guhertinê pêk bîne de nîne. Pêşnûmeya makezagonên wan a dawî jî teqeziya vê yekê ye. Bi vê makezagonê nîşan dan ku dixwazin di nav qalibên teng ên mezhebî de rejîmeke yekdest, tûnd a navendî ava bikin. Dikaribûn bi hestiyartir nêzî vê pêvajoya derbasbûnê bibûna, hebûna gelan û baweriyên cuda li ber çavan bigirtana. Çavê cîhanê tev li wan e. Niha jî di lîsteyên rêxistina terorê de ne. Her wiha ambargoyên ku li ser Sûriyê di meriyetêda ne û hîn jî nehatiye rakirin. Her çend di van cezayan de nermbûnek hatiye çêkirin jî da ku şans ji bona rejîma nû were dayîn jî, lê wan xwest ku pratîkên HTŞ’ê bibînin. HTŞ’ê li şûna ku bala xwe bide li ser yekgirtin û vejînkirina aboriyeke têkçûyî û Sûriyeyeke dabeşbûyî de gavan bavêje, ji bo ku gel bêhna xwe hilde, kampanyayên komkujiyê li dijî Elewiyan sazûman dike û hewl dide Sûriyeyê bi zorê bide ferasetekî teng û hişk a desthilatdariyê. Bi dirêjkirina pêvajoya derbasbûnê re, bi bikaranîna derfetên rêveberî û çavkaniyên dewletê yên di destê xwe de hewl dide xwe birêxistin bike. Bi bê rêxistinê hiştina gel û dûrxistina rêxistin û partiyên din hewl dide ji xwe re serweriya xwe berfireh bike.

Di bin desthilatdariya HTŞ’ê de, li şûna zagon û rêbazên şoreşgerî rêgezên derbeyê tên meşandin. Ji destpêkê ve hemû nêrîn û pêkhateyên siyasî li derve hatin hiştin. HTŞ’ê di hikûmeta demkî ya ku wê damezrand de ji bilî derdorên nêzî wan kesek û rêxistinên din cih negirt. Hilbijartina serokomariyê bi rastî jî derbeyek bû. Komên çekdar hatin cem hev û Ehmet Şara wek serokomar hilbijartin. Wekî din, HTŞ’ê desteyek ji bo kongreya neteweyî destnîşan kir. Wê desteyê ji bilî wan kesên ku ji HTŞ’ê re soza pêve girêdanê dabûn, ti kesê din venexwendibûn kongreyê. Yên hatin vexwendin jî, kesên ji nûnertiya gel dûr bûn û tevkariyê li yekîtiya neteweyî nakin. Gel ne hatibû agahdar kirin jî. HTŞ’ê bi lidarxistina civîna xwe ya navxweyî hemû desthilatî hilgirt di bin serweriya xwe, bi rastî jî ev kar kir rastiyek. HTŞ bi dûrxistina jinan ji hemû destkeftî û pêvajoyên siyasî yên li Sûriyê jî mijûl e. Nîvê hejmara welêt ji jinan pêk tê. Lê di civîneke wek kongreya qaşo netewî de divê nîvê salonê ji jinan pêk hatiba, lê ji bo pêşandanê tenê çend jin hatibûn vexwendin. Ger jin bi awayekî çalak û layîq beşdarî jiyana civakî û siyasî nebe, rewabûna van hemû pêkhateyan ji holê radibe. Di vê serdemê de ev feraseta tûndrew tenê ji bona hêzên mezhebî û paşverû yên weke HTŞ’ê dikare were dîtin.

Eşkere ye ku hewl didin li Sûriyeyê pergaleke ji desthilatiya Baas paşverûtir ava bikin. Di serdema Baasê de di makezagonê de ti şert û merc tunebû ku serokkomar misilman be. Ji welatiyên Sûriyeyê yên ji baweriyên cuda re ti kursî ne hatibûn vekirin. Tevî ku pirsgirêkên pêkanînê hebûn jî, ev sînor di makezagonê de cih negirt. Li gorî makezagonên destûra niha, welatiyên Sûriyê yên ne misilman nikarin bibin serokomar. Ev berhema hişmendiya ku li dijî nirxên wekhevî û mafên bingehîn e. Destûra bingehîn rêgeza wekheviyê ji holê rakir û hin bawerî û cudahî ji derveyi zagonan hişt. Ji ber vê yekê derket holê ku tu niyeta wan a çêkirina makezagoneke yekgirtî û berfireh nîne. Gelo HTŞ’ê wê hişmendiya derveyî demokrasiyê rêxistin dike? An jî dewleta Tirk vê cilê bi zorê li wan dike, mirov carna nikare fêm bike. Weke ku tê zanîn HTŞ’ê daxuyaniyên giştî dide û dibêje her kes wê bigihê mafên xwe. Lê ev maf di makezagonê de bi zelalî nehatine diyarkirin. Berovajî vê, maf tên qutkirin û avahiyeke yekdest û mezhebî tê pejirandin. Tirkiye demildest destwerdana peymana di navbera QSD û HTŞ’ê de kir. Wezîrên karên derve û berevaniyê yên Tirkiyê û serokê îstixbaratê derbasî Şamê bûn. Di peymanê de xalek hebû ku gelê Kurd yek ji pêkhateyên bingehîn ên Sûriyê ye û mafên wan dê bi zagonî bên misogerkirin. Ji bo têkbirina vê peymanê, Tirkiyê nerazîbûnên xwe ragihand. Hakan Fîdan di daxuyaniya xwe de wiha got: “Wê statûyên weke xweserî û federasyonê nebin. Gef li kurdan xwar ku ger xewnek wisa bibînin, em ê xeyalên wan bikin dojeh. Digel van gefên giran jî weke ku henekên xwe bi raya giştî dike û got, “Divê Kurd mafên xwe bi dest bixin” Mafên Kurdan çi ne? Ma mafê wê ye ku wek li Tirkiyê perwerdeyên bijarte yên kurdî li dibistanan yek an du saetan bidin? Jixwe Erdogan jî digot, “Li Tirkiyeyê pirsgirêka kurd tune, me çareser kir.” Ma HTŞ’ê bi heman rengî mafan fam dike? Weke ku tê dîtin, peyvên girover ên wekî maf, cewhera mafan nîşan nadin. Divê ev maf di makezagonan de bi awayekî fermî û zelal bên diyarkirin. Li Sûriyê rêyeke dûr û dirêj heye. Divê gelê Kurd û hemû pêkhateyên ku li Sûriyê jiyan dikin yên ku demokrasiyê dixwazin bi avakirina eniyeke demokrasiyê ya xurt têkoşîna xwe mezin bikin.

## Nirxandinên Cemîl Bayik



**Farûk Sakik**

Piştî ku Rêber Apo banga dîrokî kir û têkoşîna Kurdistan derbasî qonaxeke nû bû, herkesî li gorî xwe û berpirsyariya xwe nirxandin kirin.

Bi banga 27’ê Sibatê re nexşerêya Rêber Apo ya çareseriyê ket meriyetê. Rêwîtiya serdema nû dest pê kir. Ji wê roja bangê hetanî îroj gelek tişt diqewimin. Daxwiyaniyên ku Bahçelî ji nexweşxanê, Erdogan her êvarê di sofreyên fitarê de dida, êdî nikare pêşî li vê pengavê bigire. Medya Tirkiyê û medya dijîtal bi axaftinên vala nikarin bandorê li vê pêvajoyê bigirin. Di nav Kurdan de hin dengên zingarî jî nikarin pêşî li biryara Rêber Apo bigirin. Li Sûrî-Rojava, siyaset li gor nexşeriya Rêber Apo tê meşandin. Li van deveran çi were gotin û were kirin vê nexşeriyê bandor nake. Peymana ku serfermandarê QSD’ê Mazlûm Ebdî û serokomarê Sûrî yê demî Colanî îmze kirine, ne jî destûrnameya hikumeta Şamê ya demkî, nikarin pêşî li vê gava hatî avêtin û di nav civakê de hêviyek afirandiye bigire. Ev pêngav wê encam bigire. Divê ku di dîroka gavên tên avêtin de hin guhertin çêbibin. Lê divê were zanîn ku ev taktîk in. Her tişt di bin kontrola Rêber Apo de dimeşe.

PKK’ê jî ev yek baş analîz kir û li gor dîrektîfên Rêber Apo tevdigere. Daxwazek wan heye, dixwazin Rêber Apo bi kongreya PKK’ê re kontakt hebe. Herî dawî ev bang ji aliyê Murat Karayilan ve hat kirin. Dibêje ku dengê Rêber Apo bigihîje gerîlla. Ji xwe rêbertiya wî jî wa li Tirkiyê hat îtirafkirin. Dibêjin; Abdullah Ocalan lîderê PKK’ê ye. Heger lîderê PKK’ê be, divê rola wî di kongrê de hebe. Çawa di sala 1978’an de di kongreya damezirandinê de cîh girt, divê di kongreya veguhertina rêbazê têkoşînê de jî hebe. Ji bo ku ev Kongre kongreyeke dîrokî ye. Behsa qedera PKK’ê ya 50 salî dike. Li aliyê din, PKK’ê tiştek din jî dixwaze û dibêje; heger we bi Rêber Apo re serdemeke nû dayî destpêkirin, divê şertên wî yên midaxlekirina pêvajoyê ji nû de werin dîzaynkirin. Statuya Îmrali ji nû ve were nîqaş kirin. Li gor daxuyaniyên ji rayedarên PKK’ê tên dayin wê tu pirsgirêkek ji daxwazên Rêber Apo tunebe; wê yek bi yek li gor perspektîfên wî tevbigerin. Em vê yekê di nirxandinên Cemîl Bayik yên rojên dawî de dibînin.

Di van demên dawî de hin daxuyaniyên Cemîl Bayik derketin pêş. Di Stêrk tv de 58 deqîqe û di Medya Haber de jî 2 bernameyên 40 deqîqe de me Cemîl Bayik temaşe kir. Cemîl Bayik bi zimanek melahîmnerm diaxive. Lê her wek bi dengek bilind diaxive. Piştî Rêber Apo kedkarê vê tevgerê yê herî kevn ew e. Damezrînerê vê partiyê ew e. Ewe ku bi Rêber Apo re rêwîtiya azadiya Kurdistan dayî destpêkirin. Ew e piştî darbeya 12’ê Îlonê, li qada Rojhilata-Navîn ev tevger ji nû de birêxistin kiriye. Ewe ji wan kesan, kesek ku ev partî hetanî roja me aniye.

Ji ber van sedeman berî ku kongre dest pê bike, rastiya vê tevgerê ji nû de bibîra me dixe. Di encama têkoşîna PKK’ê de li Kurdistan çi bi destketine yek bi yek rêz dike û ji me re dibêje; ‘piştî evqas destkeftiyan em derbasî serdemeke nû dibin. Rêbazên têkoşînê tên guhertin. Banga Rêber Apo ya di dewsa çek de ‘aşitî û civaka demokratîk’ bi erênî pêşwazî dikin.’ Em di nirxandinên Cemîl Bayik de dibînin ku ji bilî Rêber Apo li gor daxwazên tu kesî tevnagerin.